

## Dumahîk : Dibistan....

bi awayê (ku) dinivîsîne.

Wek tê xuyakirin, ku xebata O. Sebrî, di warê zimên de, ji vê ABCyê û dersdayînê derbas nabe. Pêre jî ez bawer im, ku her kesê ABCyekê çap bike an jî dersên zimên bide, xebata wî nikare bibe dibistan, an jî rêbazê, ku dikare rehên xwe berde nava wî zimanî û xwendevan û nivîsevanan.

Xebata C. B di vî warî de yekeke tevayî ye, li ba ABCyê namîne, belê ew hemî warên zimanewaniyê vedikole, xweristiya tîpan, dengdêr û dengdaran, vedikole, wek nimûne, gava xweseriya dengdêra (U) şirove dike, dibîne ku ev dengdêra han ji dengdarên( h, g, k, q, x ) pêve nakeve paş dengdarine din, lê hatina (u) di pey ( d , t ) re , ango ( du , tu ), li gor boçûna C. B, awarte ye(4). Bi ser de ji C. Bedirxan hemî beşên zimanewanî û hevسازیya hevokê û bêşên gotinê şirove dike. Hema bi kurtahî, mirov dike bibêje, ku ewî hemî warên sêmantîk, morfologî, fonîtîk şirove kirine. Dêmek, cidahiyeke mezin di navbera nerînên her du kesayetiyên de heye. Herdu jî vêkra, bi sedema vê cidahiye, nabine damezrêner û nûnerên dibistanekê. Bi ser de jî, wek me li jor gotiye, boçûnên O. Sebrî nikarin bibin dibistan bi wateya têgeha ramiyari, lê mirov bê dudilî dikare helwest û boçûnên C. Bedirxan wek dibistanekê binavîne.

Eger ji vê bi şûnda, Siyamend Brahîm li nivîsên xwe vegere, dê bibîne, ku ew ji kaniya C. Bedirxan vediwe, û qet xwe nêzîk boçûnên O. Sebrî nake, ji ber ku ew her şeş tîpên ( Ç', h', k', p', t', x' ), ku O. Sebrî bi ser ABCyê de kirine, di nivîsên xwe de naxebitîne.

Ev yeka dide xuyakirin ku, ji hêlekê, haya wî ji xwe nebûye, û ji hêla din de ew têngihîştîye ku peyva (dibistan) wek têgehekê çî wate heye. Mixabin, Siyamend Brahîm di wê hevpyvîne de ne tenê xwe dixê vê tevliheviya beloq, belê bi ser de, hin quretiyên din jî dike.

Wek nimûne, gelekî pesna kurtepiirtûka xwe ( Gulistana zimên ) dide, ta radeya, ew piirtûk dibe jêdera nivîsevaniya hin nivîsevanên, ku beriya wî bi zimanê kurdî nivîsandine, lewre jî dibêje „ Piirtûka min Gulistana zimên gelekî nav daye, û gelek xortên ji wê xwendin bûne nivîskar, wekî Xalid Mihemed, Konê Reş, Dildarê Mîdî“. Min ev kurtepiirtûka vî camêrî ditiye, û xwendiyê jî. Ew bi xwe mîna ABCyekê ye, di dawiya salên heştê an jî destpêka nodiyên çerxa çûyî de çap bûye, qulafetê wê ne mezin û ne orte ye, belê biçûk e, rûpelên wê hindik in, min ji bîra kirî, ku çendin, lê nagihînin 70î, dikare mirovê ku zimanê kurdî nizane, hînî ABCyê û hin gotin û hevokên gelekî sade bike. Lê bi carekê nikare nivîsevanan peyda bike.

Ev yek. Ya duduwa ew e ku , Konê Reş bi temenê xwe yê biyologî û yê di qada nivîsînê de têper kiriye, ji Siyamend Brahîm mezintir e. Hema ya ku ez dizanim, ew ji beriya 20 sala de bi kurdî dinivîsîne, di destpêka salên nodî yê çerxa çûyî de kovara Gurzek gul derdixist; ango di dema derçûna kurtepiirtûka S. Brahîm de. Her weha tê bîra min, ku Dildarê Mîdî sala 1994ê helbestên xwe, roja mehrecana duwem ya helbesta kurdî, xwendin. Lê Xalid Mihemed nasnakim, tenê li guhê min ketiye, ku piirtûkên wî bi zimanê erebî, û bi awayê akadêmîk, û fernengeke wî ya kurdî-Erebî hene. Gelo heşê mirov dipejirîne ku ev kesan şagirtên S. Brahîm bin?!

Mixabin, mirovin hene nizanin, ku gotinên girs nikarin kesekî mezin bikin, lê dikarin wî zû biçûk bikin. Çima evqas qurefî!..

**(1) Biner: Osman Sebrî. Pêşgotina Elifbêya Tekûz. Cih û nimra çapê nediyar in. sal 1982**

(2) Mîr Celadet Alî Bedirxan: Rêzimana Kurdî. Amadekar: Behzat Batê. Çapxana Pencinar, nimra çapê nediyar e, Stockholm-Sweden 2006, rû 12.

(3) Osman Sebrî: Jêdera navborî. Rû 18, 19.

(4) Mîr Celadet Bedirxan: Jêdera navborî, rû 12.

**Têbîn : Ev gotar ji entirnêtê hatiye girtin**